

Tevî astengiyan, ENKS lidarxistina kongreya xwe ragihand



Kurdistan

Serokê Encumena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) Siûd Mela ragihand, tevî ku hêzên asayîşê rê neda 4emîn kongreya ENKSê li Qamişlo li dar bikeve, lê ew dibînin ku bi kombûna hemû endamên kongreyê re, kongreya wan hat lidarxistin. Biryar bû 14ê Mijdara 2022an 4emîn kongreya ENKSê li hola Zana

ya bajarê Qamişlo bihata lidarxistin û dora 150 endamên kongreyê beşdarî kongreyê bana, lê hêzên asayîşê bi bihaneya nebûna moletê, rê neda endamên ENKSê derbasî hola kongreyê bibin. Piştî qedexekirina ji aliyê hêzên asayîşê ve, endamên kongreya ENKSê li baregeha PDK-Sê ya li Qamişlo kom bûn û Serokê ENKSê Siûd Mela di

daxuyaniyekê de rexne li kiryarên hêzên asayîşê û Rêveberiya PYD girtin û got ku, bi vî awayî, ew ti carî nikarin yekrêziyê di navbera aliyên siyasî yên Kurdistana Sûriyê ava bikin. Serokê ENKSê diyar kir ku wan moleta lidarxistina 4emîn kongreya ENKSê, bi riya aliyê Amerîkî û nivîsgeha Fermandarê Giştî yê HSDê Mezlûm Ebdî

re wergirtine, lê tevî wê jî, hêzên asayîşê rê neda kongre li dar bikeve. Serokê ENKSê tekezî li wê yekê kir, ji ber van sedeman, ew dihesibînin ku kongreya wan hatiye girêdan. Ji aliyê xwe ve, Endamê Desteya Serokatiya ENKSê Mihemed Îsmail jî got ku ew dihesibînin ku wan kongreya xwe lidarxistine û ji bo

temamkirina hemû karûbarên kongreyê û belgeyan, ewê di pişt re endamên kongreyê agadar bikin. Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) di 26 Cotmeha 2011an li bajarê Hewlêrê hate damezirandin û ji 18 partî û rêxistinên civaka sivîl pêk tê, herwiha hejmareke kesatiyên serbixwe jî di nava wê de cih digirin.

«Hebûna grûpên çekdar rewşa Efrînê aloztir dike»

Kurdistan

Mekteba Siyasî ya Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya di raporta xwe ya dawî de wiha ragihand, di çarçoveya krîza Sûriyê de, hêj karvedanên nerênî yên Lûtkeya Tehranê di navbera dewletên Astana-Socî berdewam e, û berdewam e di çarçoveya lihevtêgihîştina di navbera wan de ji derveyî çareseriya siyasî ya navdewletî ji krîzê re, û Rûsiya vê yekê di çarçoveya nakokiyên berjewendiyên ligel welatên Rojava birêve dibe, û li gor berjewendiyên Îran û Sûriyê jî, ku helwesta herdu welatan ji Rojava istixlal kiriye, û piştguhkirina roleke giring ya Hevpeymaniya Navdewletî li Sûriyê û Deverê bi serokatiya Amerîka ku tekeziyê li ser çareseriya siyasî ya navdewletî dike, herwiha hewlên wê ji bo rawestandina şer û pevçûnan yên ku Tirkîyê gefa wan dike, û daxwaza vekîşandna Desteya Tehrîr El-Şam ji bo rêgirtina şerê ligel welatîyan ji bo dabînkirina

aramiyê li wê deverê. Tirkîyê hişt ku Desteya Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nusra) biçe Efrînê û armanca wê ya sereke ji vê yekê ew e kaxeza danûstandinan ligel rejîma Sûriyê bihêz bikin, û dabînkirina hizra parastina ewlekariya sînorê xwe wek ew dibêje, herwiha rûbirûbûna Hêzên Sûriya Demokrat heger pêwîst bû,

”

Hebûna çekdaran li Efrînê metirsîdar e

vekişandina bi awayekî hêsan ji wan deveran heger rêkeftin bi rejîma Sûriyê hate kirin, Tirkîyê hewil dide rûberekî berfireh dabîn bike ji bo vegera derdora milyon penaberî ji Tirkîyê, ji bo sivikirina vî barî li ser xelkê xwe, herwiha bi mebesta çêkirina delîveyekê ji bo hilbijartinên bê yên Tirkîyê di sala 2023an de, lê dibe ku ew kaxez lihev bikevin, û hevsengî were guhertinm heger ev plana



Tirkîyê ne bi erêkirineke navdewletî be, ji berk u Îro roj Emerîka parastina Hêzên Sûriya Demokrat HSD dike, tevî pêwendiyên ligel rejîma Sûriyê, û bihêzkirina rola xwe di dosya Sûriyê de. Li Kurdistana Sûriyê, Herêma Efrînê heta niha rewşa ewlekarî lê xirab e, û ev yek jî xerabtir bûye piştî derbasbûna çekdarên Desteya Tehrîr El-Şam bi berya niha bi Cebhet El Nusra dihate naskirin, hebûna grûpên çekdar li deverê bi xwe tiştêkî metirsîdar e, lê çawa heger ev grûp gelek bin, û rewş wê yekê nîşan dide ku rewşa Efrînê gelekî metirsîdar e, herwiah deverên sînorî yên ligel welatê Tirkîyê ku berdewam têne

topbarankirin û bombebarankirin bi taybet bi rêya dronan ku gelek qurbanî li pey xwe ve hiştine, û zîyanên madî gihiştîye mal û milkên welatîyên sivîl li wan deveran.

”

Pêwîst e xelkê resen îdareya deverên xwe bikin


Lewma pêwîste hêzên navdewletî yên hevalbend û damûdezgehên civaka sivîl û komîteyên mafên mirovan destêwerdanê bikin ji bo dabînkirina binemayên ewlekariyê li wan deveran, ew jî bi vegera koçberan li ser mal û milkên xwe li Efrîn, Girêsipî û

Serêkaniyê, û derxistina tevahiya grûpên çekdar û radestkirina îdareya wan deveran ji bo xelkê wê yên resen. Herwiha rewşa civakî û abûrî û jiyana rojane ya xerab ya tevahiya xelkên wan deveran, û berdewamiya rêveberiya Partiya Yekîtiya Demokrat PYD û çekdarên ser bi wê ve di kiryarên beramber Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê û partî û pêkhatayên wê, û sepandina bacan li ser welatîyan, sepandina leşkeriya neçar bi ser ciwanan de, herwaha revandina zarokan û birina wan ji bo serbaziyê, û van hemû kiryanan dihêle xelk koçber bibe û dev ji mal û milk û welatê xwe berdîn.

Pakrewanên rêya azadiyê

Hêvî Delî-Qamişlo

Hêzên pêşmergeyên kurdistanê sûriyê bi geşbûna hestên neteweyî û yekbûnê di têkoşîn û xebata xwe de berdewamin da ku destkeftên zêde bi dest bixin, û her hêviya wa ye ku lihevkirinek çêbibe, û vegerin kurdistanê sûriyê û xaka xwe û miletê xwe li wir jî biparêzin û ji bin destê dijminan rizgar bikin.. û herwiha leşkerê roj ji dema damezirandinê ta niha, bi dihan şehîd û birîndar kirin e qurbanî di ber parastina milet û xaka Kurdistanê, û di bin sîpera Alaya Kurdistanê karîbûn bi qehremaniya xwe û xwîna xwe bi tîpên



zêrîn di dîroka Kurdistanê de tomar bikin. Û hêjaya were gotin ku di roja 12ê midara sala 2015 û 2016 an ,bîranîna salvegera hejmarek ji pakrewanên pêşmergeyên Leşkerê Roj ku di şerê rûbirûbûna rêxistinên terorîst de

canê xwe kirin fîda , Û herwiha navê wan şehîdên pêşmergeyên roj li gor cih û dîroka şehîdbûnê ev in :
 **Pakrewan: Ehmed Bozan Qiço . Cih û dîroka şehîdbûnê: Gundê Kolat ,12/11/2015.
 **Pakrewan: Şêrzad

Mehmûd. -Cih û dîroka şehîdbûnê: Gundê Kolat,12/11/2015.

**Pakrewan: Etûf Tahir Omer. -Cih û dîroka şehîdbûnê: Bendava Mûsilê ,12/11/2016.

**Pakrewan: Kamîran Selah Eldîn Hiso. -Cih û dîroka şehîdbûnê: Bendava Mûsilê 12/11/2016.

**Pakrewan: Mewlûd Riyad Yûsif. -Cih û Dîroka şehîdbûnê: Bendava Mûsilê ,12/11/2016.

**Pakrewan: Sîpan Yûsif Sedûn Sîno. -Cih û Dîroka şehîdbûnê ,12/11/2016.

Hêzên pêşmergeyên kurdistanê sûriyê ku tîpên naskirin bi navê Pêşmergeyên Rojava (leşkerê roj) ,ser bi

Encûmena Niştimaniya kurd li Sûriya ve ye, Di roja 12/3/2012 an de, bi biryarekê ji Serokê Neteweyî "Mesûd Barzanî " hat in damezirandin û di bin çavdêriya kadroyên leşkerî de perwerde dibûn. û êdî leşkerê roj bûn yek ji wan leşkerên serkeftî , û qehremaniyeke pir mezin dan xuyakirin di şerê rûbirûbûna rêxistinên terorîstî û Heşda Şabî de , û milê bi mil bi pêşmergeyên Herêma Kurdistanê re beşdarbû ta bidestxistina hêvî û armancên yekîti,azadî û serxwebûna xaka kurdistanê.

62 sal di ser şewitandina sînameya Amûdê re derbas dibin

Kurdistan

Beriya 62 salan di 13ê Mijdara 1960î de 280 zarokên Kurd ku çûbûn sînemaya Amûdê, di nav pêtên agir de canê xwe ji dest dan.



Bûyer karesateke mezin bû

Heta niha sedema vê şewatê nehatiye eşkerekirin, lê hemû nîşan eşkere dikin ku ev komkujî pilankirî bû. Ji bo piştgirya

Şoreşa Cezayîrê filmeke xofê bi navê "Tawana Nîvê Şevê" pêşkêşî zarokên Amûdê hatibû kirin. Di salona sînemayê de, ku tenê tîra 200 zarokî dikir, 500 zarokên kurd lê kom kiribûn. Dema ku zarok li film temaşe dikin, di sînemayê de şewat derdikeve. Lê ji ber ku hêzên rejîma Sûriyê di dema şewatê de deriyên sînemayê venakin, 280 zarokên Kurd di nav pêtên agir de can didin.Piştî bûyerê derbarê berpîrsên sînemayê de ti helwesteke hiqûqî

nehat nîşandan û bi fermaneke lezgîn, taziye û şîna ji bo qurbaniyan hat qedexekirin. Heta şerê navxweyî yê sala 2011ê jî rejîma Sûriyê bi ti awayî destûr neda ku ji bo bîranîna komkujiyê çalakî bîn lidarxistin.Komkujiya li Sînemaya Amûdê, di dema avakirina Komara Yekgirtina Erebi ya di navbera Sûriyê û Misrê de pêk hat.Di vê demê de li dijî pêkhatyên din û Kurdan neyartiyeye mezin dihat kirin. Beriya şewitandina sînemayê bi qasî 3 mehan, 5 hezar Kurd



ji ber xebatên xwe yên polîtîk hatibûn girtin û ji ber vê yekê tê gotin ku komkujiya Amûdê bi armanca çavtirsandinê hatiye kirin. Mihemedê Seîd Axayê Deqorî di vê bûyerê de xelaskerê gelek zarokan bû. Di şeva Şewata Sînemaya Amûdê, bi dehan zarokan derdixê û

xilas dike. Di dawiyê de stûnek di ser de hat xwarê û canê xwe ji dest da.



Sînemaya Amûdê birîneke nejbîrkirî

Dara Mirazan



Henan cefer

Rojek bêhnvedanê ji rojên biharê mamosteya Raniye xwast şagirtên dibistanê bibê geşt û seyranê, yekoyek bi rêz derketin tirimpêlê çûndina bi katjimêrekê gihîştin seyrangehê û dahatin ji sîwarîkê bi dilşad û bextewar her kesî li dorhêla xwe nêhêrîn dîmenekî xweş û xemlandiye hemû ji vê dîdara dar, çiya û gelî bi asîmanê sayî re dikenê seyr man her çend heva bi hev re meşîn lê mamosteya Raniye got dûr neçin ev der bi dar e hûnê wida bibin û hayî ji xwe hebin ji xwe re geş û şad bibin

Her çend heval mîna giropekî çûn gerê, giropek berjêr ve çû vedîtin avek tenik diherikê û bi darên spîdar û şengebiyê pêçandiye, gazî hevalên xwe kirin û li qiraxa avê rûniştin û taştiya xwe xwarin digel xulxul û bilqebilqa av û wîçewîça çûkan li ser dar û di paşêla seyrangehê de lê hevalên din jî mîna giropekî bi aliyê din ve çûbûn rastî darek mezin hatin tayên caw pêxistin e hema hema şêrînê got ev dara a miraza ye dapîrê min digot darbelik û hin jî dibêjin darpaçik, diya min çîroka vê dare ji me re hewaldarî got ez ducanî nedibûm ez çûm ba dara mirazan û min daxwaza xwe xwast piştî min tayek caw

pêve girêda û min çavê xwe damirandin û min daxwaza xwe ji xwedê xwast piştî demekê daxwaza min pêk hat.

Her yekî/ê tayek caw pêxistin û mirazê dilê xwe nîşan kirin, her yekî/ê benîkek bi bazinê destê xwe ve girêdan, dema vegeerîn ba hevalên xwe mamosteya Raniye têbîn kir benîkê di bazinê destê wan de bi biyanî behitî û berve wan hat û got ev çî benîke di bazinê destê we dayî, bi çoš û meraq bi hev re gotin tayê miraza ye. Mamoste bi mizic û rûken got mirazê çî Mîran?

Mîran got em rastî dara mirazan hatin û me her yekî/ê daxwaza xwe nîşan kir û xwast ku di

paşeroja xwe de mamoste peyv birî û got te çî daxwaz xwest ... min çavê xwe damirandin û ez ketim nav xewn û nîgaşên xwe û min mirazê dilê xwe xwest ku ez bibim bijîjk, di ci de şêrînê got ez ji bêhna derman û derziyan hez nakim ezê mîna mamosteya xwe ya çeleng bibim mamoste ez ji zarokan hez dikim ezê zarokan fêrî xwandinê bikim

Mamoste bi ken û şanazî ji zarokên din pirsî û hûn zarokên delal dwaxaza we çî ye

Cîger bi kêfxweşî bersiv da û got ez ji xwendina pirtûk û çîrokan pir hez dikim ez dixwazim di paşeroja xwe de bibim çîroknivîs û ezê çîrokên xwe

bişînim ji şêrînê re ta ku ji şagirtan re bixûnê

û tu Dilşad daxwaza te çî ye?

Herbilî û bû te teya xwe û got ez ez dixwazim bibim wênevan ku ez wêneyên xwe diyarî hevalên xwe bikim

Mamoteya Raniye bi dilşad û arezû zarok hembêz kirin û got hûn zanin dara mirazan çî ye ku hemû hêvî û xewnên we bi cih bîbin, zarokan bi hev re gotin na...

Mamote got dara hînbûn û zanîne ye, xwandinê ye, bi hînbûn û zanîne hûnê hêvî, daxwaz û xewnên xwe bi cih bînin û hemû arîşe û tengahiyên xwe çareser bikin

Tirsa agir


Ezîz Xemcivîn

“Dayê, ez ê biçim sînemayê!
Na!
Çima Dayê?
Wê wek zarokên Amûdê li te bê!
Tirsa agirê agir maye agir..
Cegera dayikan hêj sotî ye,
tîpên hestan hêj bi agir têtin nivîsandin..
Çav bê bendewarî nîn in,
dil bê azarî nîn in,
dayik bêyî hêsirbarîn nîn in!
Amûdê, guliyên xwe ji mêj ve li ser pakrewanên xwe kurt kiriye..
Amûdê, çavên wê zuha nebûne,

dikele, dikele, şewata cegeran navemire!
Agiro, ji me bigere zarokên me ne êzing in!
Agiro, dûrî kewara me bikeve, em ne mozqirtik in!
Mase û pirtûk li benda tiliyên şagirtên me ne..
Mal û malbat, xanî û axa hewşan çaverêyên we ne!
Amûdê birîna te nayê girtin,
qemûşk nagire,
“Şermola” kelêşêrên mirinê li ser girê te rojane bang didin!
“Şermola” zarokên me di himêza te de şiyar in, nanivin!
Dawiya hefteyê çivîkên evînê

seredana te dikin..

Malên me wêran in, wêran in, wêran in, wêran innn!
Dîrokê xwe bisoje û pelgên tarî ji xwe çeke,
li bejna te kwînêrên penceşêrê pir û pir dibin!
Dîrokê, nikarim derdên xwe di reşpelgîn te şirove bikim,
ne dikarim navê te di ferhenga kulên xwe de bicih bikim!
Stemê malwêranê, canên nazik di patoza te çî hûrdek in!
Ne hêsir tene cobarên xwe, ne xwîn di damarên te de sar dibe!



Li welatekî jibîrbûyî sêwiyekî tiliya xwe her sibeh dimêjim..
Li kolanên tengaviyê serwalê êşa xwe pîne dikim..
Evînê, malneketê memikên dilovaniya xwe ji nav lêvên kesera me derneke!
Evînê, sîwana xwe ji ser sotîcanan raneke!
Pênûsê,
ji agirê çîrok û

çivanokên me çengên te hatine sotin!
Ava kanî û sûlavan çî vemirînê dikin, mafir ko hêtûna komkujiyan ji dohnê zarokên me be!
Tîp li ber rivîna êgir pîyên xwe bend dikin,
helbest jî darê xwe datîne û her gorekê sinbilekî li ber diçikîne!